

Çîroka jîyanê



Deverên mirov lê peyda bûn
Semta kuçkîrin û belavbûna mirovan



Mirovên Destpêkê:

Mirovê bikêrhatî (Homo Habilis): Berî du milîon salan peyda bûyîne. Li ser du pîyan bi rêve diçû. Hestîyên wî li rojhelata efrîka û li asîya hatîne dîtin. Hindek kar encam didan wek helkirina agirî ji bo xwe pê germkirinê û xwarînlênanê. Ev gîyandare bi kevintirîn bapîrê mirovan dihete hijmartin.


Mirovê Nîyandırtal:

Mirovekê jîr bû ye. Berî cil hizar salan peyda bûyî ye û şiyaye xwe digel sir û sermayê bi guncînît. Ji ber hindê jî şiyaye li rojhelata navîn û Ewrûpa bijît. Vî mirovî amîrên xwe ji berî çedikirin. Berî (28) hizar salan mirovê nîyandırtalê di wî mahîyê li Sipanîya mirîye û bi mirina wî ev nifşê mirovan vebrîyaye.

Mirovên Şikeftan:

Ev mirove nêçîrvan bûn. Jîvana wan li ser berê daristanê û nêçirkirina canewerên kuvî bûyî ye û di şikeft û kulkên sade ve dijîyan. Ev mirove nêzîktirîn bapîrê mirovê evro bûyî ye. Tiştê herê sernicirakêş li def mirovê şikeftan dahênanâ hunerî bûyî ye û vî mirovî dest bi nîgarkêşanê li ser dîwarên şikeftan kirîye ku ew nîgar li hindek şikeftên Firensa û Sipanîya hatîne vedîtin.

Zirmirov



Berî bi çendin milyon salan canewerek li ser erdî hebû ku nîşanên mirovan lê hebûn. Hestîyên wî canewerî li Rojhelata Efrîka hatine dîtin. Ji hestîyên wî dîyar bû ku ew canewer li ser du pîyan radiwestîya û bi rêve diçû û hindek amîrên sade wek dar û beran bi kar di ïnan. Lê mejîyê wî gelekê biçûk bû ji ber hindê ji regezê mirovan nahête hijmartin.




Hindek kel û pelên ji berî hatîne çekirin.







Xîşl û çekê xemlandinê



Kulkekê ji dar û pîstê canew-
eran hatîye çêkirin û banê wê
bi kîlpêñ (mamot)î hatîye
dapoşîn.



Nîgarkêşan li ser dîwarê şikeftek



Mirovekê agirî hel diket. Ji (10)
heta (20) deqîqeyan pêdivîya heta
agir hel dibû.

Wêneyekê aşopî li ser jîyana komeka nêçîrvanan berî (2500) salan.

